Bila bîranînên giranbuha vala derbas nebin

Memê Alan

- Piştî germtirîn rêz û silav ji pakrewanên rewşenbîriyê û peyva azad û ji nav wan , ji lehengê nemir Dr . Nûridîn Zaza re …

Pêwîste em di bîranîna îsal a Nûredîn Zaza de , em jiyana wî ya tijî çalakî û xebatên curbecur di ber çavan re bibin û wînin û sûdan jê werbigrin .

Mirovên di jiyana xwe de mezin bin , herweha di mirina xwe de jî mezin in . Vaye ev merovê ku , em wî bi bîra xwe tînin yek ji wan mirovên gewre ye .

Çimkî ew di raman û helwestên xwe de li pêş hevdema xwe bû . Ew di hemî warên jiyanê de , mirovekî dûrbîn bû , û xwedî kesayetiyek rêzanî û ramangîrî xuya bû .

Vêca pêwîste ku , em çend nimûnên balkêş ji nêrîn , raman , rol û sinciyên wî ji xwendevanan re bînin zimên :

* Dr . N.Z , ji bo rewşa gelê Kurd û çareserkirina pirsa wê li Sûriyê , avakirina rêxistineke rêzanî pêwist didît . Wêlomê jî rola wî di avakirina pirograma rêzanî ya yekemîn partiya Kurd li Sûriyê , sala 1957 an de , serekîn bû .

* Baweriya wî bi guftûgoyê , bona çareserkirina kêşe û pirsgirêkan hebû. Wêlomêjî wî herdem û berdewam doza danûstandinê û lihevkirinê di nav gelên herêmê de dikir . Û digot : Riya tewrî rast û durist bo çareseriya pirsa Kurd li herêmê , riya danûsatandinê ye

*Hezkirina wî ji hemî zimanan re , lê , bêtirîn ji zimanê Kurd re . Ji ber ku , wî hebûna gelê Kurd di hebûna zimanê dê de didît .Û hêviya wî ew bû , ku gelê Kurd bi dev û diranan , û bi her awî , zimanê xwe yê şêrîn û bedew biparêze û wê fêrî zaroyên xwe bike .

* Ew di warê çand û toreya kurdî de , rewşenbîr û ramangîrekî mezin bû . Ji ber ku , wî didît çand û tore stûnek ji stûnên hebûna gelan in .

* Nûredîn Zaza di nêrîn û helwestên xwe de , mirovekî wêrek û dilêr bû , lê ew nêrîn û helwest pîvayî , li gor heyama heyî û ne rêzderbûn û bi vê pîvan û dûzanê , wî sala 1960î , di zîndanê de , li pêş dadgehê rastiya hebûna gelê Kurd û zimanê wî weha pêşkêş û diyar kir :

Hebûna gelê Kurda li ser axa xwe , di çarçewa komara erebî ya yekgirtî de , li rex birayên xwe yên Ereb , rastiyeke dîrokî ye . Ev gel xwedî ziman û folklorekî taybet e , pêve hatî girêdan û bingehên wê parastiye .

Aniha jî em di hevdemek ji jiyana mirovatiyê de ne , hewil tê kirin ku , alîkarî û lihevkirin di navêna gelan de çêbibe , da ku , jiyana mirov baştir û xweştir bibe , aştî peyda bibe , û mirov bi rûmeta xwe ya mirovatiyê bêtir hest bibe . Û di dermafê ziman û folklora Kurd weha got :

Tucarî rojekê ji rojan , pêgirtina gelê Kurd bi ziman û folklora xwe , nabe jêderek ji jêderên hevcudatî û nakokiya Kurd û Ereban . Herweha di baweriya

D.R.(10)